



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (2), pp. 521-539

<http://www.ijoks.com>

Dê û Dêmarî di Çîrokên Hîzanê (Bîtlîs) da<sup>1</sup>

Leyla KAPLAN<sup>2</sup>  Hasan ÇIÇEK<sup>3</sup> 

Received: June 12, 2025

Accepted: Aug 28, 2025

Kurte

Çîrok yek ji cureyên vegotina devkî ne ku nirx, kodên çandî, têgihîştina exlaqî, rol û stereotîpên mêr û jinan ra têkildar ji nîşkekî bo nîşkekî din vediguhêzin. Di vê cureyê da ku ji aliyê taybetmendiyên xeyalî û derasayî ve dewlemend e, leheng insan, ajal û heyînên deresiruşt in. Ev lêkolîn di çîrokên berbelav ên Hîzana girêdayî Bîtlîsê da li ser temsîliyeta figurên dayik û dêmarîyê disekine. Di lêkolînê da hejdeh mînakên çîrokan hatin bikaranîn. Çîrokên hatinê bikaranîn ev in: Edlê û Ebbas, Dirkê, Herdemcan, Hespa Xwelîyê, Mîrza Miheme û Şêx Sînem, Ehmedê Beyrema, Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê, Şengê Pêngê Alîçengê, Şengê Pengê, Zengilo Mengilo, Çeleka Zêrî, Fatma Xanim û Lêvres, Dêmarî, Eysê û Mamê Hirç, Dara Leyl û Reqqasê, Kalikê Têş, Mîrza Miheme, Nîsko. Hebûna legengên wekî dê û yan jî dêmarîyê ji bo bikaranîna van çîrokan şerta bîngêhîn e. Di xebatê da ji lêkolîna wesfînê tehlîla naverokî hatîye bikaranîn. Armanca lêkolînê ew e ku eşkere bike gelo ev herdu figurên jin di çîrokên Hîzanê da bi çî awayî derbas dibin. Exlebî dêmarî wekî lehengên hesûd, çavnebar, dilxerab, xwepereş derbas dibin û ji nevisiyên xwe ra xirab in; lê dayik wekî lehengên dilovan, parêzvan, fedakar, birehm cih digirin. Di vê lêkolînê da nûveya herî balkêş ew e ku dayik hin caran li hember zarokên kesên din tevgerên neyînî nîşan didin û vedigerin figurên nebaş. Ev dayik di çîrokan da wekî pîra mirovxwar, pîrhebok derbas dibin. Ev rewş ji bo destnîşankirina guhêrbariya figura dayikê giring e.

**Peyvên Sereke:** Çîrok, Dayik, Dêmarî, Bîtlîs, Hîzan, Pîra Mirovxwar, Pîrhebok

<sup>1</sup> Ev gotar ji teza lîsansa bilind a nivîskarê ya bi sernavê “Di Çîrokên Hîzanê da Motîfa Dê” (2018) hatîye derxistin ku tez bi şewirmendîya Prof. Dr. Hasan ÇIÇEK li Zanîngeha Yüzüncü Yılê li Enstîtuya Zimanên Zindî di Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî da hatîye amadekirin.

<sup>2</sup>Corresponding Author, Ph.D, Lecturer, Mardin Artuklu University, Faculty of Literature, Department of Kurdish Language and Literature, Mardin, Türkiye. E-mail: [leylakaplan@artuklu.edu.tr](mailto:leylakaplan@artuklu.edu.tr)  
**ORCID:** <https://orcid.org/0000-0001-7887-9017>

<sup>3</sup> Prof. Dr., Van Yuzuncuyil University, Faculty of Education, Department of Educational Sciences, Van, Türkiye, E-mail: [hcicek@yy.edu.tr](mailto:hcicek@yy.edu.tr) **ORCID:** <https://orcid.org/0000-0001-5914-8323>

**Recommended citation:**

Kaplan, L. (2025). Dê û Dêmarî di Çîrokên Hîzanê (Bîtlîs) da. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (2), 521-539, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1718445>

**Birth Mother and Stepmother in Hizan (Bitlis) Fairy Tales****Abstract**

Fairy tales are one of the oral narrative genres that transmit the value judgments, cultural codes, morality, roles and stereotypes of men and women from generation to generation. In this genre, which is rich in imaginary and extraordinary features, heroes are humans, animals and supernatural beings. This study focuses on the representations of birth mother and stepmother figures in fairy tales commonly known in Hizan district of Bitlis province. Eighteen fairy tale examples were used in the study. It is possible to list the fairy tales used for the study as follows: Edlê û Ebbas, Dirê, Herdemcan, Hespa Xwelîyê, Mîrza Miheme û Şêx Sînem, Ehmedê Beyrema, Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê, Şengê Pêngê Alîçengê, Şengê Pengê, Zengilo Mengilo, Çêleka Zêrî, Fatma Xanim û Lêvres, Dêmarî, Eysê û Mamê Hirç, Dara Leyl û Reqqasê, Kalikê Têş, Mîrza Miheme, Nîsko. The primary condition for the study was that these fairy tales should have mother and/or stepmother characters. Content analysis, one of the qualitative research methods, was used in the study. The aim of the study is to reveal how these two female figures are frequently encountered in the fairy tales specific to the Hizan region. In general, stepmothers are jealous, malicious, mistreating their stepchildren and self-interested characters, while birth mothers are compassionate, caring, protective, sacrificial and selfless characters. The most striking finding in this study is that in some cases, birth mothers may exhibit negative attitudes towards the children of others and turn into negative figures. These mothers appear in fairy tales as witches. This situation is important in terms of showing that the mother figure in fairy tales is not fixed but variable.

**Keywords:** Fairy Tale, Birth Mother, Stepmother, Bitlis, Hizan, Witch

**Hizan (Bitlis) Masallarında Öz Anne ve Üvey Anne****Özet**

Masallar, topluma dair değer yargılarını, kültürel kodları, ahlak anlayışını, kadın ve erkek rol ve kalıpyargılarını kuşaktan kuşağa aktaran sözlü anlatı türlerinden biridir. Hayali ve olağanüstü özellikler bakımından zengin olan bu türde kahramanlar insanlar, hayvanlar ve tabiatüstü varlıklardır. Bu çalışma Bitlis iline bağlı Hizan ilçesinde yaygın olarak bilinen masallardaki öz anne ve üvey anne figürlerinin temsillerine değinmiştir. Çalışmada on sekiz masal örneğine başvurulmuştur. Çalışma için başvurulmuş masalları şu şekilde sıralamak mümkündür: Edlê û

Ebbas, Dirkê, Herdemcan, Hespa Xwelîyê, Mîrza Miheme û Şêx Sînem, Ehmedê Beyrema, Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê, Şengê Pêngê Aliçengê, Şengê Pengê, Zengilo Mengilo, Çêleka Zêrî, Fatma Xanim û Lêvres, Dêmarî, Eysê û Mamê Hirç, Dara Leyl û Reqqasê, Kalikê Têş, Mîrza Miheme, Nîsko. Çalîşma iin bařvurulan bu masallarda anne ve/veya üvey anne karakterlerinin olması öncelikli řart olmuřtur. Çalîřmada nitel arařtırma yöntemlerinden ierik analizi kullanılmıřtır. Çalîřmanın amacı, Hîzan yöresine özgü masallarda sıklıkla karřılařılan bu iki kadın figürünün ne řekilde yer aldığını ortaya koymaktır. Genel itibarı ile üvey anneler kıskan, kötü niyetli, üvey çocuklarına kötü davranan, çıkarına düřkün karakterler olarak yer alırken; öz anneler merhametli, řefkatli, korumacı, fedakâr, özverili karakterler olarak yer almıřlardır. Bu çalîřmadaki en dikkat çekici bulgu öz annelerin bazı durumlarda bařkalarının çocuđuna karřı olumsuz tavırlar sergileyebilmesi ve olumsuz figürlere dönüřebilmesidir. Bu anneler masallarda cadı olarak yer almaktadırlar. Bu durum masallardaki anne figürünün sabit deđil de deđiřken olduđunu göstermesi bakımından önemlidir.

**Anahtar Kelimeler:** masal, öz anne, üvey anne, Bitlis, Hîzan, cadı.

### Destpêk

Di kurdîya kurmancî da ji bo cureya çîrokê gelek binavkirin hene. Hin ji wan binavkirinan ev in: “Çîrok, çîrçîrok, hîkaye” (Îzolî, 2007: 133), “çîvanok, roman, efsane, serborî” (Bedirxan, 2009: 98), “metele, metelok, mesele, derew” (Farizov, 1994: 199). Ev cure di zazakî da wekî “sunik, fistunik, mesela” (Turgut, 2008: 244), “sanike, estaneke” (Gruba Xebatê ya Vateyê, 2001: 149) derbas dibe. Vegêrên vê cureyê wekî çîrokbêj, çîrvanokbêj, çîrokvan derbas dibin. Pertev ji bo cureya çîrokê pênaseyeke wiha dike: “Çîrok, cureyek ji vegotinên gelêrî nin ku tê da cih didin serborî û lehengên derasayî û mijara wan xeyalî û bi devkî belavbûyî nin. Di kurdîya kurmancî da ji bo vê cureyê vegotinê, navên wekî çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, xemîřok, mesel, meselok, metelok, serborî, serpêhatî, hîkaye û hwd. têne bi kar anîn” (2008: 87). Elin di pênaseya çîrokan da li ser berbelavbûna wan disekîne. Ew di wextên nedîyar da derbas dibin. Ji ber nedîyarîyê ye ku çîrok bi qalibên wekî “hebû tunebû”, “wextekî di dewrên berî da, di zemanê berî da” dest pê dikin. Heyîn an jî mirovên çîrokan wekî “padîřahêk, jinek, keikek, parsekek, dêwek, derwêřek, darek” derbas dibin. Di çîrokan da ya giring nasnav e, kîbûna wî kesî yan jî wê

kesê zêde giring nîn e. Exlebî bi armanca perwerdeyê tên gotin û kurt in, li ser detayan nasekinin û gelek fonksiyonel in (Elçin, 1986: 368-370).

Çîrok ji alîyê hêmanên derasayî ve gelek dewlemend in. Dêw, perî, zarokên bi qasî nîskê, dinyaya tarî, Sîmurga ku dikare Mîrza Miheme hilgire û bibe, heywanên diaxivin û hwd. Di çîrokan da şîret û dersdan heye. Guhdêr bi rêya çîrokan teşwîqê başî û qencîyê tê kirin. Exlebî di çîrokan da yên baş tên xelatkirin û yên nebaş jî tên cezakirin. Taybetmendîyên wekî sebr, wêrekî, zîrekî, duristî, fedakarî, başî tên xelatkirin û tevgerên wekî hesûdî, çavnebarî, azwerî, derewî, tiralî tên cezakirin. Ji vî alîyî ve peyama ku çîrok dixwaze bide, zelal e (Kurt, 2021: 439). Subaşî, biserketina karakterên baş û têkçûna karakterên xirab wekî nêzî alema zarokan dinirxîne û dibêje ku zarok bi vî awayî di derbarê jîyanê da perwerde dibin û agahîyan wedigirin (2025: 29).

Dia û nifirên lehengan gelek caran qebûl dibe. Lehengên feqîr digehijin miraz û meqsedên xwe, carinan keçên bedew ên paşê ra dizewicin û dewlemend dibin. Zarokên li ber destê dêmarîyan dia dikin, diayên wan diqebile, vedigerin teyran û ji pacê difirin û diçin. Lehengên çîrokan exlebî taybetîyên karakterîstîk nîşan didin: *Mîrza Miheme*: zana, aqil, şans; *Dêmarî/Jinbav*: xirabî, fesadî, bêbextî, zilm, hesûdî; *Pîra Mirovaxwar*: hîle, xirabî; *Birayê Piçûk*: şans, aqil, rastbûn; *Jinbira*: hesûdî, xirabî; *Bira*: hêz; *Zirbira*: hesûdî, xirabî; *Zirxwişk*: hesûdî, xirabî; *Pîrê*: alîkarî; *Hirç*: ehmeqtî; *Rûvî*: fêlbaz, hilebaz (Kaplan, 2018: 18-20).

Çîrok “digel peyama û naverokan xwe di serî de li ser binyadeke vegêranî ava bûne ku ev jî hebûna vegêr/çîrokbêj, karakter, zîncîreya rûdanê, dem û cih e” (Subaşî, 2024: 412). Çîrok ji sê beşên bingehîn pêk tînin. 1. *Destpêka Çîrokê (Serê Çîrokê)*: Ji vî beşê ra “çîvanok” (Yıldız, 2017: 230) jî tê gotin. Çîvanok ji peyvên bêteleqê pêk tînin, armanca bikaranîna wan ew e ku bala guhdêran bikêşe û bi wan bide hesandin ku çîrok dest pê dibe. Çend mînakên çîvanokan dikarin wiha bînin rîzkirin: “Hebû tunebû, kes ji Xwedê mezintir tunebû... Hebû tunebû rehme li dê û bavê hazirguhderan bû... Hebû tunebû, carek ji caran rehme li dê û bavê guhdaran... Careke ji caran, rehmet li dê û bavê zehmetkêş û xwendevanan...” (Kaplan, 2018: 31-32). 2. *Bingeha Çîrokê (Gewde)*: Di vî beşê da çîrok rasterast tê vegotin. Çîrokbêj bûyerên ku di çîrokê da derbas dibin bi awayekî kelecânî vedibêje ku bala guhdaran bikêşe û ew dawîya çîrokê mereq bikin. Bi bikaranîna van gotinên wekî “Çû çû, heft kevirê li dû”, “Pî li min rebenê”, “Wey li min rebenê”, “Ez mam çikî tenê”, “Mala min şewitiyo/ê”, “Eliyê min û te, Kezîzera min û te...” (Pertev, 2008: 97) çîrokbêj bala guhdaran zindî dihêle. 3. *Dawîya Çîrokê (Serencam)*: Çîrokbêj di vî beşê da

hemû hunerên xwe destnîşan dike û çîrokê bi awayekî serkeftî diqedîne. Li vir êdî guhdêr jî meraqa xwe rizgar dibin. Di dawîya çîrokan da bi piranî “Çîroka me çû diyaran, rehme li dê û bavê guhdaran”, “Ew li wir gihane mirazê xwe, tu/em jî li vir”, “Çîroka me li diyaran. Dilovanî û başiya Yezdanê Dilovan li dê û bavên guhdaran. Ji bilî fesad û ewanan” û hwd. tên gotin (Kaplan, 2018: 32).

Zimanê çîrokê zimanekê herikbar, rewan û rojane ye (Yıldız, 2019: 19). Ev ziman li gor herêmê diguhere û di çîrokan da terza axaftina herêmê xuya dike. Ji xeynî axaftinê bi heman awayî şopên kevneşopîyên herêmê, cil û bergên wan, xwarin û vexwarina wan jî di çîrokan da xwe didin der. Lewre di vegotina çîrokan da li gor herêman guherîn çê dibe. Azadowskî di vê mijarê da guherînên di çîrokan da xwezayî dibîne û dibêje ku: “Çîrokbêj, di çîrokê da gelek cihan diguherîne. Ev guherîn wekî taybetîyên zimên, vegêr; di binyata çîrokê da, di xîzkirina lehengan da, di bîrdozî û erka çîrokê da jî derdikeve pêşîya me. Bi vî awayî çîrok, hevsengîya vegêr, guhdêr û çîroka kevneşopîyê ye” (Vgz. Turhan Tuna, 2014: 3). Sakaoğlu jî li ser guherînên çîrokê disekine û taybetmendîyên çîrokbêjên hoste tîne zimên: “Çîrokbêj dema çîrokan dibêje divê her tim li aliyê kesên ku heqê wan tê xwarin û qels be. Ew, vê rewşa xwe bi hin peyvan eşkere dike ku ew gotin di binyata çîrokê da tine ne. Ya rastî çîrok xwedîyê binyatên qalibgirtî nîn in. Ew ne mîna helbestê ne. Lê motîfên wê westar in. Her çîrokbêj dikare heman bûyerê bi peyvên cuda bêje. Vegêr di wextê vegotinê da li ser çîrokê hin tiştan zêde dikin. Heta ew xwe bi çîrokê ra dikin yek.” (2007: 130).

Çîrok hêmanekê giring a çanda devkî ye. Lê çawa tê zanîn geşedan û guherînên di jîyana rojane da bandor li ser çanda devkî dikin û dibin sedema guherîna wan. Îro di roja me da televizyon û înternet ketîne nav malan û vê rewşê jî bandor li ser vegotina çîrokan kirîye. Herçiqas çîrok heman çîrok be jî vegêr guherîne û çîrokbêjên gundî û bajarî heman çîrokê bi heman peyvan venabêjin. Peyv û têgihên bi jîyana bajarî ra têkildar ketîne nav vegotinê û ev rewş jî bûye sedema guherînên vegotinê (Kaplan, 2018: 17).

Detay di çîrokan da ne giring in. Çînkû zêdebûna detayan dibe ku guhdêran aciz bike û bibe sedema fêmnêkirina çîrokê. Lewre çîrokêj hin caran valahîyên mezin dixin navbera wext û cihan da û bi yek peyvê derbasî pêncî sal paşê dibin (Kaplan, 2018: 33). Di dinyaya çîrokan da her tişt pêkan e. Ew sînorên ku di jîyana rasteqîn da hene di çîrokan da ji holê radibin û çîrok sînoran

qebûl nake. Li gor çîrokê bêderfetî tune ye, ew lehengê feqîr dike paşe û mirovên xirab bi awayekî bêrehm dide cezakirin (Taner, 1988: 9).

Çîrokbêj exlebî jin in. Kunos çîrokbêjan wekî “pîrejin” dide nîşan (2001: 89). Li gor Gökalp çîrokbêjî ji dayikan derbasî keçikên wan dibin. Herçiqaş çîrokbêjên mêr hebin jî exlebî çîrokbêj jin in û hunermendê qada xwe ne (Vgz. Sakaoğlu, 2007: 38). Exlebî çîrokbêj kal û pîr in û ew di vegotina çîrokan da ji serpehatîyên xwe sûd werdigirin. Di civatên jin û mêr têkel da exlebî çîrokbêj mêr in. Gelek caran ew çîrok ji bo guhdêran wekî xelatan in (Kaplan, 2018: 34).

Formel vegotinên qalibgirtî ne û di binyata çîrokan da peywir û şiklên wan ên dîyarker hene (Sakaoğlu, 2002: 250). Çîrok bi formelan destpê dikin û dîsa bi formelan diqedin (Keskin, 2019: 207). Bikaranîna formelan bi hostetîya çîrokbêj ve têkildar e. Ev formel ji bo hin armancan tîn bikaranîn. Di destpêka çîrokan da formel tîn bikaranîn ku bala guhdaran bikêşe û wan bide hesandin ku çîrok dest pê dike. Çîrokbêjên hoste gelek caran serî li formelan didin û wan di cihên rast da bi kar tînin. Çîrokên kurmancî ji aliyên formelan ve gelek dewlemend in. Mînakên wekî “hebû tunebû”, “hebû tunebû rehme li dê û bavê guhdaran / hazirguhdaran bû”, “hebû tunebûrehmet li dê û bavê min û we guhdaran bû”, “hebû tunebû wextekî”, “hebû tunebû kes ji Xweda mezintir tunebû”, “hebû tunebû ... hebû”, “wextekî”, “hebû tunebû di wextek zemanê berê da ... hebû”, “hebû tunebû di hundur dîrokê da... hebû”, “hebû tunebû di mêj da ... hebû”, “zemanekî”, “carek ji caran başîli dê û bavê guhdaran”, “Di demeke borî ya dûr û dirêj da... hebû”, “Hebû carek ji caran”, “rojek ji rojan”, “Careke ji caran, rehmet li dê û bavê zehmetkêş û xwendevanan” (ji Çolpan, 2007; Akyol, 2006a; Çetin, 2003; Alkan, 2003; Sadînî, 2013 Vgz. Kaplan, 2018: 36-37) hin ji mînakên formelên destpêkê ne. Bi rêya formelên borînê ji bûyerek derbasî bûyerek din dibin û exlebî ji bo guherîna bûyer û lehengan tîn bikaranîn. Çend mînakên formelên borînê wiha ne: “çû çû hey çû”, “şev û roj çûn hey çûn”, “hatin çûn”, “pîr çûn hindik çûn”, “pîr geriya hindik geriya”, “dem şev bû, şevereş bû, dinya tarî bû, ha li vir ha li wir...”, “roj li pey rojan çûn, şev li pey şevan herikîn û derbas bûn”, “roj li pey rojan çûn, hefte li pey hefteyan buhurîn û meh li pey mehan derbas bûn” (ji Xamo, 2014; Zinar, 2013; Bozarslan, 200; Bozarslan, 2006 Vgz. Kaplan, 2018: 37). Guhdarên baş dema van formelan seh dikin êdî dizanin ku çîrok qedîya. Formelên dawîyê yên berbelav wiha ne: “Çîroka me çû diyaran, rehme li dê û bavê guhdaran”, “Çîroka min çû nav dal û dirîyan, rehme li dê û bavê we hemûyan”, “Ew li wir gihane mirazê xwe tu/em jî li vir”, “Ew li wir digehin mirazê xwe, em li vir digehin heqê xwe”, “Xwedê mirazê wan li wir bike ya me jî li vir”, “Li vir çîroka me qedîya çû diyaran, Rehma

Xwedê li dê, bav û miriyên we xwendevan û guhdaran, hezar carî nale li hefsed bavê cenderme, tasîldar û neyaran, şên û ava be mala belengaz û hejaran”, “Çîroka me li vir dûwayî dît, revî çû diyaran, rama Xwedê li mirî dê û bavê xwendevan û we guhdaran, hezar cari nalet li kedxwar, sîtemkar, tehsîldar û cendirmeyên neyaran, çûcar ji xwe bîrnekin rewşa kesîb, belengaz, hejar û jaran”, “Xebroşka mi li diyara, rehme li dê û bavê hazir û godara”, “Ew çûn miradê xwe, têr şahî şa bûn, win jî miradê xwe”, “Mesela min li diyara, hezar rehme li dê o bavê godara”, “Çîroka me li diyaran, başî li bav û diyên guhdaran”, “Çîroka me li diyaran. Dilovanî û başiya Yezdanê Dilovan li dê û bavên guhdaran. Ji bilî fesad û ewanan”, “Ew gihiştin mirada xwe, serê guhdaran sax be.”, “Çîrvanok çû ji xwe re, hemû şiltaxî û dexesî dûrî guhdaran û vebêjan”, “Çîrvanok çû ji xwe re, bihar hat ji me re, hemû dexesî û zikreşî dûrî derê çîrvanokbêj û guhdaran”, “Çîrvanok çû diyaran, rehmet li dê û bavê çîrvanokbêj û guhdaran, bêwefatî ne li derê canik û camêran”, “Çîrok çû ji xwe re, rojên rind ji me re. Dibêjin “camêr ku meriv bikujin, hiltînin jî”, “Çîrok çû ji xwe re, alîkarxwazî ji me hemûyan re”, “Me çîroka xwe got, ji vê çîrokê jî aqil girtin bara we ye” (Ji Çolpan, 2007; Akyol, 2000; Akyol, 2006b; Deniz, 2013; Arda, 2010; Fîdan, 2014 Vgz. Kaplan, 2018: 37-38). Ji xeynî van formelan di heqê hejmar, wext, reng, cih da jî formel hene û di vegotina çîrokan da gelek caran tên bikaranîn. Di nav hejmarên formel da yên herî berbelav 3, 7, 40 in. Ev hejmar di wextan da jî tên bikaranîn: 3 şev û 3 roj, 7 şev û 7 roj, 40 şev û 40 roj. Dinyaya tarî, dinyaya ronî, cihê çûnûnehatinê, heft qat binê erdê, Çîn ji bo formelên cihan dikarin wekî mînak bèn dayîn.

Jin wekî dayik, dêmarî, bûk, keç, xwesî, dapîr, cadu di çîrokan da cih digirin. Ew hem leheng hem jî vegêrên çîrokan in. Di vê xebatê da em ê zêdetir li ser dayikbûn û dêmarîbûna jinê bisekinin. Ji bo xebatê wekî herêm me Hîzan hilbijart. Hîzan navçeyeke girêdayî Bîtlîsê ye û ji aliyê gundan ve gelek dewlemend e. Di berhevkirina çîrokan da gund cihên giring in ji ber ku ew der ji bo parastina çandê zêdetir berxwe didin, derengtir dikevin bin bandora geşedanên teknolojîk û yên din. Em ji bo xebatê gund bi gund, mal bi mal gerîyan û ketin pey çîrokbêjan. Lê em rastî rastîyeke wisa hatin ku mixabin gelek çîrojbêjên navdar nekarîn yek çîrokê jî bêjin. Wan wekî sedem gotin ku piştî televîzyon ketin nav malan êdî vegotina çîrokan kem bû heta li hin malan bi dawî bû. Ev rewş jî bû sedema jibîrkirina çîrokan.

Piştî xebateke dûr û dirêj me hin çîrok tomar kirin lê ji ber ku mijara me jin e di nav wan çîrokan da bijartin hate kirin û yên ku lehengên jin tê da tune ne nehatin bikaranîn. Ji bo vê xebatê hejdeh heb çîrok hatin bikaranîn (Kaplan, 2018: 74-141). Di nav çîrokan da Çîrokên Şengê Pêngê

Alîçengê, Şengê Pengê, Zengilo Mengilo û Çêleka Zêrî, Fatma Xanim û Lêvres varyantên heman çîrokê ne. Di xebatê da ji lêkolîna wesfînî analîza naverokî hatîye bikaranîn. Daneyên lêkolînê ji çîrokên Hîzanê yên hatine berhevkerin û tomarkirin pêk tên. Çîrok ji aliyê temsîlkerina figurên dê û dêmarîyê ya di nav vegotinê da hatine vekolîn.

### 1. Dayik

Dayikbûn, nirxeke nasnameyî ye ku jin piştî anîna zarokekî/ê bi dest dixin. Ew tecrûbeyê jinên xwedîzarok e. Ji vî alîyî ve rewşeke gerdûnî ye û li gor wext, mekan û erdnîgarîyê naguhere (Akıncı & Gürhan, 2024: 3). Li gor Collin û Laborie dayikbûn hebûneke bijartî ye. Ew hem hêzek e ku jîndarekî tîne dinyayê hem jî rêya xwestina îmtîyaza civakî û siyasî ye (ji Collin û Laborie, 2015 vgh. Ankaralı, 2025: 67). Ji ber vê yekê zarokanîna dayikê di rewşên aloz da bi rengekî polîtîk xwe dide der (Kan, 2024: 95).

Zarok, norm û erkên civakî bi rêya dayikan hînî dibin. Lewre dayik, ne tenê ji anîna zarokan di heman demê da ji mezinkirin (Suvağci, 2021: 767) û lênihêrîna zarok û kal û pîran jî berpirsîyar in. Lênihêrîna wan di nav erkên jinan (dayik) da cih digire (Çetin & Kaplan, 2025: 54).

Jung (2019) di pirtûka xwe ya “*Four Archetypes*” (Dört Arketip/ Çar Arketîp) da dayikbûnê di sê koman da dinirxîne: *Dayika Şexsî*: dayika bîyolojîk a zarokan an jî fîgûra yekem a jin e ku zarok ewil wê nas dikin (wekî dapîr, pîrik). *Dayika Sembolîk*: ev dayik di mît, çîrok û sembolên dînî da hin caran wekî dayikên dilovan hin caran jî wekî hêzên tirsîner cih digirin. 3: *Dayika Arketîpî*: arketîpa dayika gerdûnî ye. Di nav paradoksa “*loving and terrible mother*” da tê terîfkirin. Ew hem hez dike hem jî tirsnak û tuneke e. Dikare bê gotin ku di çîrokên da dayik exlebî li zarokên xwe dinêre û li wan xwedî derdikeve, baş û hestîyar e. Di nav taybetmedîyên hevpar ên dayikan da hezkirin, fedakarî û dilrehmî heye (Taş Çetin, 2024: 104). Di nav çîrokên Hîzanê da dayik bi taybetmendîyên başbûn, şîretkarî, fedakarî û pasîvbûnê derbas dibin. Herçiqas di meseleyên giring da li paş xuya bikin jî ew, ji bo saxî û silametîya zarokên xwe çî ji destê wan bê dikin û her tim başîya wan dixwazin.

#### 1.1. Başbûn

Başbûn di hemû çîrokên da wekî taybetmedîyeke hevpar a dayîkan e. Di çîroka Dirkê da dema jinbiraya Dirkê bêbextî li Dirkê dike herçiqas birayên Dirkê bawer bikin jî dêya wê ji bûka bawer nake û dizane ku bêbextî li keça wê tê kirin. Dayik di vê çîrokê da keça xwe diparêze, piştgirîyê dide wê û jê bawer e (Kaplan, 2018: 82-84).

Di çîroka Edlê û Ebbas da Edlê herçiqas jineke kêmaqil be jî dîsa bala wê li ser keça wê ye û her tim başî û silametîya keça xwe dixwaze. Ew piştî zewaca keça xwe diçe dikana pertalan û dixwaze ji keça xwe ra kinkeke xweşik çêke. Di dawîyê da hemû pertalan diçîritîne û nikare nîyeta xwe bi cih bîne lê dîsa jî tê dizanin ku ew ji bo bextewarîya keça xwe wisa dike, herçiqas bi sernekeve jî (Kaplan, 2018: 84-87).

Di çîroka Herdemcanê da dayik yeka baş e û ji keça xwe bawer e. Dema melayê gund bêbextî li Herdemcanê dike dêya Herdemcanê tu carî bawer nake û piştgirîyê dide keça xwe. Ew her tim saxî û silametîya keça xwe dixwaze. Piştî salan dema Herdemcan tê û xwe wekî Keçelok dide nasîn û dibe xizmetkarê wan guneha dêya Herdemcanê pê tê, nahêle Keçelok di nav kulavan da razê û di nav mala paşê da ji bo wî odeyek dide amadekirin (Kaplan, 2018: 96-101).

Di çîroka Hespa Xwelîyê da, dayik daxwaza keça xwe bi cih tîne û ji bo keça xwe hespekî ji xwelîyê çê dike ku keça wê bikaribe biçe ba birayên xwe (Kaplan, 2018: 101-104). Di çîroka Mîrza Miheme û Şêx Sînem da wekî dêya Sêx Sînemê Şêx Zade derbas dibe. Ew dayîkeke pir baş e û hemû daxwazên zavayê xwe lib û lib bi cih tîne (Kaplan, 2018: 54-55). Di çîroka Kalikê Têş da dêya lehengî jineke pir baş e. Dema kurê jinikê keçîkek tîne û dibêje ez ê pê ra bizewicim dayik qebûl dike û li hemberî kurê xwe dernakeve. Ji ber ku tenê zarokê wê heye, kurê wê çawa bixwaze wisa dike (Kaplan, 2018: 107-108).

## 1.2.Şîretkirin

Aqil û hişê dayîkan her tim li ser zarokên wan e, ew naxwazin tu qeda û bela bîn serê zarokên wan. Ji bo ewlehîya zarokên xwe dayik her tim şîretan li wan dikin û çavên wan li ser zarokan e. Heman rewş ji bo dayîkên di çîrokan da jî derbasdar e. Ew zarokên xwe ji xirabîyan diparêzin û serguha wan her tim li ser zarokan e.

Di çîroka Ehmedê Beyrema da Beyrema herçiqas miroveke nebaş be û şîretên nebaş li zarokên xwe bike jî dîsa jî ew wekî dayîkeke şîretkar derdikeve pêşberî me. Beyrema digel zarokên xwe diçin beravê lê paşê ferq dikin ku hin tişt ji bîr kirine û nebirine. Ew ewil keça xwe paşê jî kurê xwe dişîne mal û şîretan li wan dike dibêje heger xalê we ji we tiştêkî xwest nedin û werin (Kaplan, 2018: 87-91).

Di çîroka Herdemcanê da dê û bavê Herdemcanê berîya çûna hecê şîretan li keça xwe dikin û dibêjin haja xwe û mala xwe be, qur'anê hînî be û bixwîne. Dê û bav mal, milk û xulaman

emanetê keça xwe dikin, şîretan li keça xwe dikin paşê berê xwe didin hecê û diçin (Kaplan, 2018: 96).

Di çîroka Hespa Xwelîyê da dayik li ser daxwaza keça xwe jê ra hespekî ji xwelîyê çêdike da ku keçik biçe ba birayên xwe. Ji ber ku hesp ji xwelîyê ye dayik şîretan li keça xwe dike û dibêje tu car ji hespê ra nebêje “bisekine”, heger tu jê ra bêjî bisekine dê hesp bibe xwelî û tu yê di rê da bimînî. Keçik guhdarîya dêya xwe dike û bi rê dikeve lê di rê da ji bîr dike û ji hespê ra dibêje ‘bisekine’. Keçik şîreta dêya xwe ji bîr dike û hesp vedigere xwelîyê (Kaplan, 2018: 101-104).

Di çîrokên Zengilo Mengilo (Atlı, 2023: 162-163), Şengê Pengê Alîçengê û Şengê û Pengê da şîreta dayikê xuya dike. Hersê jî heman çîrok in tenê di navbera varyantan da guherînên biçûk tene. Di van hersê varyantan da jî bizin ji kehrikên/zarokên xwe ra şîretan dike ku dema ew ne li mal be zarokên wê zerarê nebînin. Ji zarokan ra dibêje derî ji kesî ra venekin. Dayik dixwaze ku zarokên xwe ji gur û hirçan biparêze lewre her roj berîya ji mal derketinê şîretan li wan dike (Kaplan, 2018: 55-57).

Di çîroka Mîrza Miheme û Qîza Qarqarê Çînê (Kaplan, 2018: 110-114) da padişahê û sê kurên wî hebûne. Çavên padişahê kor bûne û kurên wî ji bo vebûna çavên bavê xwe ketine pey tasa qîza qarqarê Çînê. Kurê piçûk Mîrza Miheme di rê da rastî pîreke mirovxwar tê lê ji ber ku şîrê pîrê dimêje êdî dibe wekî kurê pîrê û pîra mirovxwar zerarê nade wî. Pîra mirovxwar ji Mîrza Miheme ra dibêje êdî ez wekî dayika te, tu jî wekî kurê min î. Pîrê ji bo bidestxistina tasa qîza qarqarê Çînê rê nîşanê Mîrza Miheme dike û şîretan lê dike. Di rê da çî astengî hebin hemûyan ji Mîrza Miheme ra dibêje û wî ji wan astengî û talûkeyan xeberdar dike. Di vê çîrokê da tê dîtî ku herçiqas pîra mirovxwar yeka nebaş be jî dema Mîrza Miheme şîrê wê vedixwe êdî dibe wekî zarokê wê û pîrê wekî dayîkeke şîretkar hereket dike.

Di çîroka Mîrza Miheme (Kaplan, 2018: 134-140) da sê kurên dayîkekê hene. Navê wan Miheme, Ehmed, Mîrza Miheme bûye. Darekî wan ê sêvan hebûye lê her sal wextê komkirina sêvan dibînin ku yek sêv li ser darê nemaye. Her sê bira ji dêya xwe ra dibêjin em ê nobet bigirin gelo her sal kî tê û sêvên me dibe. Dêya zarokan ditirse û naxwaze zarokên wê biçin û nobetê bigirin, ji wan ra dibêje neçin, dibe ku li wir mirovek hebe û we bikuje, ji bo sêvekê xwe nexin di nav talûkê da. Dayik şîretan li zarokên xwe dike lê zarok guhdarîya dêya xwe nakin û diçin.

### 1.3.Fedakarî

Dema li çîrokan tê nihêrtin ‘fedakarî’ wekî taybetmendîya sereke ya dayikên dilpak, tê dîtin (Kasimoğlu, 2022: 746). Ew di nav çîrokan da bi taybetmendîya xwe ya fedakarîyê gelek caran derdikevin pêşberî me: ji bo zarokên xwe ked didin, şer dikin û ji talûkêyan natirsin. Çi ji destê wan bê ji bo başîya zarokên xwe dikin. Di çîroka Şengê Pengê Alîçengê (Kaplan, 2018: 120-122) da bizinekê û sê kehrikên wê hene. Dema gur diçe kehrikan dixwe bizin bêtirs dikeve pey gurê, pê ra şer dike bi strihên xwe zikê gurê diçirîtîne û zarokên xwe ji wir derdixîne.

#### 1.4. Pasîvbûn

Di civakên pederşahî da ya ku ji jinan tê xwestin pasîvbûna wan e. Ew exlebî di rola biryardayîne da nîn in. Zêdetir mêr û zarokên kur biryarên giring didin û ew jî rîayet dikin. Ew rewş jinê pasîvîze dike. Mînaka pasîvbûna dayikê di çîroka Dirê (Kaplan, 2018: 82-84) da xuya dike. Dema jinbiraya Dirê bêbextî li Dirê dike û dibêje Dirê namûsa xwe lewitandîye bav û birayên Dirê ji jinbiraya wê bawer dikin lê dayika Dirê dizane ku neheqî li keça wê dikin. Ji ber ku dayik yeka kor û pîr bûye pasîv sekinîye û nekarîye alîkarîya keça xwe bike. Dê, bav û birayên Dirê bi şev ew terikandine û çûne. Di vê çîrokê da pasîvbûna dayikê bi pîrbûn û korbûna wê ve hatîye girêdan.

Di çîroka Herdemcanê (Kaplan, 2018: 96-101) da dema mela bêbextî li Herdemcanê dike û ji padîşah ra dibêje keça te bênamûsî kirîye padîşah ji mela bawer dike û pîr hêrs dibe. Ew ji xulamên xwe ra dibêje keça min bibin cihekî dûr, wê bikujin û kincên wê yên bixwîn ji min ra bînin ku bizanim mirîye. Jina padîşahê dike û nake nikare padîşahê îqna bike ku keça wê nekujîne. Li vir jî dayik pasîv e û yê ku biryarê dide bav e, padîşah e.

Di çîroka Kalikê Têş (Kaplan, 2018: 104-109) da dema kalikê Têş tê û keça dayikê ji bo xwe dibe dayik û xwişkên keçikê dikin qîrîn û hewar, xwe li erdê didin, digirîn lê nikarine kalikê Têş û kalik keçikê dihingire û dibe. Di vê çîrokê da herçiqas dayik nexweze keça xwe bide kalikê Têş jî dîsa bi zorê keça wê dibin û nikare tişteki bike.

## 2. Dêmarî

Figûra dêmarîyê di nav çîrokan da her tim bi awayekî neyînî derbas dibe (Demir, 2017: 504). Li gor Jung dêmarî ew dayik e ku jehr dide û ji rê derdixîne (2019: 21-22). Çavnebarîya dêmarîyê di nav taybetmendiyên wê yên sereke da cih digire. Ev çavnebarîya wan hesteke wisa ye ku dibe

sedema xirabîyên gelek mezin. Dikare bê gotin ku sînore van xirabîyan tune ye. Çavnebarîya wan dibe sedema narsîstîya wan (Kaval, 2024: 698).

Di çîrokên da dêmarî û pîrhevok wekî wan jinên ku dixwazin hêza xwe bi kar bînin, derbas dibin. Ew li hemberê pergalê derdikevin. Lê li vir tiştekî balkêş heye ku ji xeynî nasnameyan zayenda kesên jî bal dikêşîne. Li hemberê dêmarîyê modela zirbavî tune ye. Wate, ya ku xirabîyê temsil dike, jin e. Ev jin jî exlebî navser an jî pîr in û hesûdîya bedewîya nevisîya xwe dikin û dixwazin wan tune bikin (Ankaralı, 2025: 72).

Fîgûra dêmarîyê nevisîyên xwe di mal da naxwaze, şidetkeke fîzîkî û derûnî li wan dike û zordest e. Ew her tim qêrîn dide zarokan û emir dike (Sarpkaya, 2019: 67-68). Digel dêmarîyê hebûna zirbira û zirxwişkê jî ji bo zarokan bandoreke neyînî dike. Zarok, di adaptasyona jîyana nû da zehmetî dikêşînin (Aslantürk & Kılıç, 2020: 1185).

Demarî di çîrok û cureyên vegotinê yên gelerî da exlebî bi taybetmendîyên nebaş derbas dibin. Ew hesûd in, zilmê li nevisîyên xwe dikin û dekbaz in. Ew her tim dixwazin ku zarokên wan ji nevisîyên wan baştir, sipehîtir û serkeftîtir bin. Bi dekûdolaban nevisîyên xwe ji malê dûr dixin. Nevisî mecbûr dimînin ku li hemberê xirabîyên dêmarîyê hişyar û di nav têkoşînê da bin. Gelek caran tê dîtin ku dêmarî nevisîyên xwe bi destê bavê wan dide kuştin.

## 2.1.Xirabî

Di çîrokên Hîzanê da dêmarî wekî kesên xirab derbas dibin. Di çîrokên Çêleka Zerî û Fatma Xanim û Lêvres da dêmarî hêmaneke berbiçav e. Ev herdu çîrok ji alîyê mijarê ve yek in û varyantên heman çîrokê ne. Di çîroka Çêleka Zerî da dêmarî û zirxwişka Fatmayê hene û qet jê hez nakin. Dêmarî her tim dixwaze ku keça wê ji nevisîyê wê baştir û sipehîtir be. Ew dixwaze keça wê jîyaneke baştir bijî çinku ya ku layîqê tiştên baş e keça wê bixwe ye. Lewre hesûdî û xirabîyê dike û dema kurê paşê dixwaze pêlava windabûyî bi Fatma bide ceribadin aciz dibe û naxwaze Fatma biceribîne. Dema xêla dawetê ji bo Fatmayê tên ku ji kurê paşê ra bibin hesûdî dike û keça xwe dide ser mexfûrê û Fatma jî di tenûrê da xef dike ku şûna Fatmayê keça wê bibe bûka paşê (Kaplan, 2018: 74-76). Di çîroka Fatma Xanim û Lêvres da navê keça dêmarîyê wekî Lêvres derbas dibe. Fatma keçeke ewqas sipehî ye ku dêmarî û zirxwişk her tim hesûdîya wê dikin û xirabîya wê dixwazin. Dema kurê mîrî digel Fatmayê dizewice zirxwişk û dêmarî diqehirin. Demarî piştî dawetê rojekê şehêkê jehrîkirî dihingire û dibe ku porê Fatmayê pê şeh

bike. Dema porê wê şeh dike Fatma dizivire kevokekê û ji pacê difire û diçe (Kaplan, 2018: 94-96)

Di çîroka Dêmarî da dêmarîya zarokan yeka zehf xirab e û ji zarokan zehf aciz e. Nefreta wê ya bo zarokan ewqas zêde ye ku dixwaze zarokan bi destê bavê wan bide kuştin. Rojekê ji mêrê xwe ra dibêje ez çûme ba mela û mela gotîye ku heger hûn serê zarokan jê bikin û yekî bidin serê zevîyê yekî jî bidin binê zevîyê dê genimê we hêşîn be û çêbe. Dêmarî dixwaze ku bavê zarokan bixapîne û zarokan bide kuştin ku ji wan xelas be (Kaplan, 2018: 81-82).

Dîsa di çîroka Ehmedê Beyrema da dêmarîya Ehmed û Beyrema heye. Dêmarî jineke zehf xirab bûye û her tim li zarokan daye. Dêmarî ewqas zilmê li zarokan dike ku zarok êdî nikarin îdare bikin û ji mal direvin û diçin. Dêmarî dibe sebeb ku gelek xirabî bên serê wan zarokan (Kaplan, 2018: 61-62).

## 2.2.Hesûdî

Hesûdî, di nav taybetmendiyên dêmarîyan da ya herî belavbûyî ye. Çavnebarîya wan zêdetir ji bo zarokên wan e ku naxwazin nevisîyên wan ji zarokên wan bedewtir, serkeftîtir, çêtir û baştir bin. Di xwestina xirabîya nevisîyan da daxwaza berçavkirina zarokên wan heye. Çinku di çîrokan da exlebî nevisîyên dêmarîyan ji keçên wan bedewtir û jêhatîtir in. Lewre hesûdîya dêmarîyê ya ji bo bedewîya nevisîyê di gelek çîrokan da derdikeve pêşîya me (Demir, 2020: 504). Hesûdîya dêmarîyê di çîroka Fatma Xanim û Lêvres da gelek berbiçav e. Dema kurê mîr ji bo ceribandina îskapîne tê mala wan dêmarî gazî Fatmayê nake ku îskapîne biceribîne. Daxwaza dêmarîyê ew e ku îskapîn li gor pêyê keça wê be û ew bibe bûka mîrî. Hesûdîya dêmarîyê piştî zewac û zarokanîna Fatmayê jî dewam dike. Dêmarî dixwaze bi şeha jehrkirî porê Fatmayê şeh bike ku Fatma bimire. Dîsa di varyanteke din a heman çîrokê da dêmarî hesûdî dike û dema xêl ji bo birina Fatmayê te şûna Fatmayê keça xwe Eyşo dide ser mexfûrê û Fatmayê jî di bin tenûrê da xef dike. Ew ji bo kurê paşê keça xwe layîq dibîne û naxwaze nevisîya wê bê bijartin (Kaplan, 2018: 62).

Di nav mînakên çîrokan da bi gelemperî dayik bi taybetmendiyên erênî yên wekî baş, dilsoz, fedakar, gîrêdayî zarokên xwe, şîretkar derbas dibin; dêmarî jî wekî kesên xêrnexwaz, hesûd, fesad derbas dibin. Lê hin çîrokan da îstîsnayên vê rewşê xuya dikin. Dayik hîn caran birehm nîn in û li ber kuştina zarokên xwe pasîv dibin. Di vê rewşê da bê guman gelek faktor bandor kirine. Di çîroka Eyşê û Mamê Hirç (Kaplan, 2018: 91-94) da mînaka vê rewşê heye. Eyşê digel

gundîyan diçe pincarê û ji alîyê hirçekî ve tê revandin. Piştî revandinê heft sal derbas dibin û heft lib têjîkên wan çê dibin. Rojekê bi saya şivanê gund malbata Eysê xwe digehînin Eysê û wê direvînin, dibin. Birayên Eysê dema xwişka xwe dibin ji têjîkan şeş heban dikujin tenê yek dimîne û Eysê dibêje em ê libê bibin mal pê ra bileyîzîn. Di rê da birayê Eysê wê libê jî dikuje lê Eysê dengê xwe nake. Li vir Eysê wekî dayik derbas dibe lê li hemberî kuştina zarokên xwe dernakeve û dengê xwe nake. Di tevgera Eysê da bandora revandina wê ya bi zorî, zarokanîna ne ji dil, girtîbûna wê ya ji alîyê hirçê ve heye û ev hemû bûne sebeb ku ji kuştina zarokên xwe aciz nebûye. Di çîroka Hespa Xwelîyê (Kaplan, 2018: 101-104) da dayîka xirab derbas dibe. Ev dayîk wekî pîrhevtar derbas dibe û mirovan dixwe. Dema keçîka leheng ji bo agir diçe mala wan keça pîrhevtarê hişyarî dide wê û dibêje dêya min yeka mirovxwar e, ji vir here, heger te bibîne dê te jî bixwe. Keçîk bi zorî xwe ji destê pîrhevokê xilas dike. Di vê çîrokê da herçiqas dayik zerarê nede zaroka xwe jî zerarê dide kesên din û wan dikujîne û dixwe.

Di çîroka Dara Leyl û Reqqasê (Kaplan, 2018: 76-80) da jî em rastî dayika nebaş tînin. Di vê çîrokê da dayik wekî pîrê derbas dibe û yeka zana ye. Jina padîşah yeka bêweled e û diçe ba pîrê ku derman bide wê û zarokên wê çêbin. Pîrê wextekî xwestîye ku padîşah digel keça wê bizewice lê ji ber ku nezewicîye ehd kirîye ku ewda xwe bike. Pîrê dermanê dide jina padîşahê lê bi şertekî, dibêje di wextê welidînê da ez ê jî li ba te bim. Jina padîşahê ducanî dibe û dê cewîyên wê çêbin. Di wextê razanê da pîrê tê û ji şûna cewîyan du heb cewrikên seyê didane nav dergûşê û ji padîşahê ra dibêje jina te cewrikên sê anîye. Padîşah pir hêrs dibe û cezayeke mezin dide jina xwe. Ew jina xwe li meydanê dide girêdan û kî ji meydanê derbas be tif dike rûyê jinikê heta ku jinik dimire. Dîsa di heman çîrokê da pîrê xirabî li cewîkan jî dike û her carî ji Fatma ra tiştêkî wisa dibêje ku bibe sebebê mirina birayê wê. Ewil behsa dara leyl û reqqasî dike paşê jî dara çengalê. Anîna van herdu daran jî pir xeternak e û yên ji bo anîna van daran çûne mirîne. Birayê Fatmayê Mîrza Ehmed ji bo xwişka xwe bi rê dikeve û her carî bi alîkarîya yekî din wan daran tîne. Pîrê nagehîje armanca xwe û di dawîyê da jî dibe sebeba kuştina xwe.

Di çîroka Nîsko da (Kaplan, 2018: 117-120) jineke bêweled hebûye. Rojekê kalekî diçe mala jinikê û dibîne ku zarokên wê tune ne ji jinikê ra dibêje qemçeke nîskan bîne, ez ê pif bikim dê ew nîsk hemû ji bo te bibin zarok. Jinik qemçeke nîsk tîne, kalo dia û pif dike nîskan hemû nîsk dibin zarok. Ji ber ku her yek ji wan tiştêkî dixwaze jinik hêrs dibe û bi kinûşkê wan dimale û diavêje nav tenûrê. Jinik paşê ji kirinên xwe poşman dibe û dibêje xwezî yek bimaya û xwarina bavê xwe birîya zevîyê. Tê dîtî ku dayik zêdetir ji bo kirina karan zarokan dixwaze. Dîsa di

heman çîrokê da pîra miroxwar heye û ew jî dayik e û keçekê wê heye. Dema pîra mirovxwar dixwaze Nîsko bixwe keça pîrê alîkarîya Nîsko dike û ji bo kuştina dêya xwe rê nîşanê Nîsko dide. Li vir dayik herçiqas zerarê nede keça xwe jî zerarê dide yên din û mirovan dixwe.

### Encam

Ev xebat bi awayekî berawirdkirî li ser temsîliyeta dayik û dêmarîyê ya di çîrokên Hîzanê da disekine. Bi awayekî gelemperî tê dîtîn ku dêmarî bi taybetmendiyên neyînî ên wekî hesûdî, nebaşî, çavnebarî, xirabî; dayik jî bi taybetmendiyên erênî yên wekî başî, dilsozî, fedakarî, şîretkar cih digirin. Lê divê bê destnîşankirin ku hin caran başbûna dayikan a ji zarokên xwe bi heman awayî ji bo zarokên din derbasdar nîne. Dayikên nebaş ku exlebî wekî pîra mirovxwar û pîrhevok derbas dibin herçiqas zerarê nedin zarokên xwe jî li aliyê din zerarê din zarokên din û qesta kuştina wan dikin. Lewre mirov nikare gelemperîkirinekê di vê mijarê da bike û bêje hemû dayik baş in. Di çîrokên da dayik bi rolên westar zêdetir bi rolên guhêrbar cih digirin. Lê ji bo dêmarîyan gelemperîkirinekê dikare bê kirin lewre di hemû çîrokên Hîzanê yên ku hatine bikaranîn da, dêmarî wekî figurên xirab derbas dibin.

Di çîrokên herêma Hîzanê da dê û dêmarî di nav lehengên sereke da cih digirin. Stereotîpên bi dêmarîyan ra eleqedar di çîrokên Hîzanê da hebûna xwe parastine û dêmarî, di hemû mînakên da bi awayekî kesên hesûd û nebaş derbas dibin. Dîsa stereotîpên bi dayikan ra eleqedar ên wekî fedakarî, başî, dilsozî, dilnermî, pasîvî di çîrokên Hîzanê da jî bi heman awayî derbas dibin ji xeynî çend îstîsnayan. Yên ku îstîsna ne exlebî ji dayîktîya wan zêdetir li ser mirovxwarbûna wan bal hatîyê kêşandin. Ya ku wan cuda dike pîrhevokbûna wan e.

Bi rêya vê xebatê hate dîtîn ku figûra dayîkê di çîrokên da yek rehendî nîn e û guhêrbar e. Dîsa hate dîtîn ku figûra dêmarîyê yek rehendî ye û her tim neyînî ye.

Em hêvî dikin ku ev xebat ji bo xebatên bi vî rengî ra rê veke û di çîrokên da jin ne tenê wekî dayik û dêmarî bi heman awayî wekî keç, bûk, xwesî jî bîr nirxandin û bi rêya van lehengan di navbera çîrokên herêmên cuda da berawirdkirin bîr kirin.

### Çavkanî

- Alkan, A. (2003). Çîroka rovî û gur. Stenbol: Elma.
- Akıncı, A. & Gürhan, N. (2024). Toplumsal deęişme ve annelik ilişkisi üzerine sosyolojik bir çalışma: Konya örneęi. Şarkiyat, 16(1), 1-17. DOI: <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1465365>
- Akyol, H. (2000). Çîrokên kurdî Senem Xanim. Stenbol: Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Akyol, H. (2006a). Ji zargotina kurdî. Stenbol: Do.
- Akyol, H. (2006b). Keçelikê Serdar. Stenbol: Do.
- Ankaralı, F. (2025). Masallarda üvey annelik: Derleme çalışması. Akademik Platform Eğitim ve Deęişim Dergisi, 8(1), 65-83.
- Arda, A. (2010). Hirç û pirç. Stenbol: Doz.
- Aslantürk, H. & Kılıç, A. K. (2020). Üvey aileye sahip gençlerde aile aidiyeti: Nitel bir analiz. Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, 24(3), 1171-1189.
- Atlı, H. (2023). Vekolineke berawirdî di navbera Şengilo û Mengiloya Heciyê Cindî û Gur û Heft Karikên Biçûk a Birayên Grimm de. The Journal of Mesopotamian Studies, 8(2), 159-170. DOI: <https://doi.org/10.35859/jms.2023.1343756>
- Bedirxan, C. A. (2009). Ferheng (Kurdî-Kurdî). Stenbol: Avesta.
- Bozarslan, M. E. (2000). Gurê bilûrvan. Stenbol: Deng.
- Bozarslan, M. E. (2006). Pepûk. Diyarbakır: Deng.
- Çetin, A. & Kaplan, L. (2025). Mardin Artuklu Üniversitesi Türkçe ve Arapça sosyoloji bölümü öğrencilerinin toplumsal cinsiyet algıları: Karşılaştırmalı bir araştırma. PESA Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi, 11(1), 51-73.
- Çetin, N. (2003). Pixço. Stenbol: Perî.
- Çolpan, R. (2007). Çîrokên gelî. Stenbol: Weşanên Dozê.
- Demir, R. (2020). Üvey anne ile Fatma masalının psikanalitik yöntemle incelenmesi. Sinop Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 4(2), 499-512.  
DOI: <https://doi.org/10.30561/sinopusd.753323>
- Deniz, H. (2013). Ji çîrok û çîvanokên kurdan. Stenbol: Aram.
- Elçin, Ş. (1986). Halk edebiyatına giriş. Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları.
- Farızov, I. O. (1994). Türkçe-Kürtçe sözlük. Ankara: Özge.

- Fidan, M. (2014). Çîrokên gelêrî ji herêma Botan. Stenbol: Berbang.
- Grûba Xebatê ya Vateyê (2001). Ferhengê tirkî-kirmanckî (zazakî). Stenbol: Weşanxaneyê Vateyî.
- Îzolî, D. (2007). Ferheng (kurdî-tirkî, tirkî-kurdî). Amed: Weşanên Deng.
- Jung, C. G. (2019). Dört arketip. (Çev. Zehra Aksu Yılmaz). İstanbul: Metis Yayınları.
- Kan, G. (2024). Li dor zayend û netewe(tî)yê jina kurd di berhemên Eliyê Evdilrehmanî da. Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, 37, 89-111. DOI: <https://doi.org/10.15182/diclesosbed.1486817>
- Kaplan, L. (2018). Di çîrokên Hîzanê da motîfa dê. Teza Lîsansa Bilind, Wan: Zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî.
- Kasımoğlu, S. (2022). Türk masallarında anne motifinin psikanalitik çözümlemesi. Motif Akademi Halkbilimi Dergisi, 15(39), 743-753. DOI: <https://doi.org/10.12981/mahder.1133980>
- Kaval, Y. (2024). Nardaniye Hanım masalında narsisistik karakter analizi. Folklor/Edebiyat, 30(119), 689-708. DOI: <https://doi.org/10.22559/folklor.2672>
- Keskin, N. (2019). Folklor û edebiyata gelêrî. Stenbol: Avesta.
- Kunos, İ. (2001). Türk halk edebiyatı. Ankara: Akçağ.
- Kurt, B. (2021). Öksüz Kız masalının Max Lüthi'nin stil analizi yöntemine göre değerlendirilmesi. Akademi Sosyal Bilimler Dergisi, 8(24), 434-448.
- Pertev, R. (2008). Zarok û çîrok. Stenbol: Weşanên Dozê.
- Sakaoğlu, S. (2002). Gümüşhane ve Bayburt masalları. Ankara: Akçağ.
- Sakaoğlu, S. (2007). Masal araştırmaları. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Sarpkaya, S. (2019). Samed Behrengî'nin eserlerinde çocuk. Mecmua, (7), 62-73.
- Subaşı, K. (2024). Tipolojîya dem û cihî ya çîrokên gelêrî yên kurdî. Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 12(29), 411-432.  
DOI: <https://doi.org/10.18506/anemon.1415302>
- Subaşı, K. (2025). Peywendîya çîrokên gelêrî û zarokan di gel pêşniyazeke rêbazên xwendinê yên çîrokan. International Journal of Kurdish Studies, 11(1), 21-37.  
DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1605278>

- Suvağci, İ. (2021). Zayenda civakî di lorîyên kurdî da. Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, 9(3), 763-770. DOI: <https://doi.org/10.18506/anemon.819298>
- Taner, N. (1988). Masal arařtırmaları. İstanbul: Art-San.
- Taş Çetin, F. (2024). Kuşaklararası annelik ve çocuk yetiřtirme deneyimleri: Mardin örneđi. Doktora Tezi. Elazığ: Fırat Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Turhan Tuna, S. (2014). Türk masallarının varoluşçuluk açısından incelenmesi. Muğla: Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi Yayınları.
- Turgut, H. (2008). Türkçe-Zazaca sözcük. İstanbul: Do.
- Xamo, Z. (2014). Hebû tunebû antolojîya çîrokên zarokan. Stenbol: Rupel.
- Yıldız, A. (2017). Hunera vegotina bedew a devkî û nivîskî 1. Stenbol: Lorya.
- Yıldız, A. (2019). Li gor rêbaza Vladimir Propp analîza çîrokeke kurmancî. Nubihar Akademi, 11, 11-45.
- Zinar, Z. (2013). Kewê çîrokbêj. Wan: Sîtav.

### Extended Abstract

Fairy tales are one of the types of oral narratives that take place in the cultural memory of the society and function both educationally and for entertainment purposes by being transferred between generations. These narratives not only feed the imagination of individuals but also shape social norms, values and perceptions of identity. Society's family structure, gender roles and stereotypes, and moral values are indirectly transmitted to children through fairy tales. In this context, how the characters in fairy tales are represented, especially the roles with which female characters are identified, is an important field of study. The mother and stepmother figures are also noteworthy among these characters. Because these two figures have strong meanings in terms of both social and individual memory.

The aim of this study is to examine how the birth mother and stepmother are represented in the fairy tales of Hizan district of Bitlis province. The perceptions that society has developed about women and motherhood are reproduced in a unique narrative form through fairy tales. In this context, the functions of these figures in the narrative, their character traits and their positions in the plot are discussed comparatively. The data used in the study were selected from the previously compiled and transcribed tales of Hizan region. The selected fairy tales were analyzed

through content analysis and the positive or negative representations of mother and stepmother figures in the narrative were evaluated in the context of the plot.

The findings of the study show that stepmother is mostly portrayed with negative qualities in traditional narratives. The stepmother figure, who appears as a character who is jealous, merciless, manipulative and hostile towards her stepchildren, is often the direct carrier of the character with a malicious function in fairy tales. On the other hand, it is seen that the birth mother is mostly presented as compassionate, protective, self-sacrificing and self-sacrificing. However, this is not always the case. One of the remarkable findings of the research is that in some fairy tales, birth mothers can also turn into characters exhibiting negative behaviors. In particular, the figure of the birth mother who is harsh, exclusionary or harmful towards other women's children shows that the character roles in fairy tales are not fixed but contextual. Such examples reveal that the figure of the birth mother can also become morally open to criticism under certain circumstances.

In this context, the social reflections of the concept of motherhood were analyzed through the representations of birth mother and stepmother in Hizan fairy tales. The contrast between the idealized form of motherhood in fairy tales and the forms of motherhood that are outside the moral boundaries provides clues about society's perception of good and bad mothers. The malevolent role attributed to stepmothers should be considered as a reflection not only of individual behavior patterns but also of social structures and norms. Similarly, the fact that birth mothers are sometimes depicted with negative behaviors shows how discourses on the sanctity of motherhood are limited through narratives.

The unique contribution of the study is that by analyzing the birth mother/stepmother opposition, which is often presented as a dichotomy in fairy tales, in the local context, it reveals that these figures are shaped not only by typological characteristics but also by the narrative context. This analysis of Hizan fairy tales shows that female characters are not presented in a fixed and unidirectional way; on the contrary, they can diversify with the context.

In future research, examining fairy tales from different regions with such a comparative approach may contribute to developing a more comprehensive perspective on representations of femininity and motherhood.